

Şandeke Partiyên Rojavaya Kurdistanê serdana Partiya Demokrat kir

»»» R:3



Di jiyana miletana de serok û rêvebir

»»» R:5



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (352) 21-06-2019 Buha (1000) Tûmen*

Vê carê dijwar e

»»» R:2



## Xev ji çavên dîktator herimî

Fermanderê Giştî yê Spaha Pasdaran a terorîst bas ji derbazkirina sînorên esmanî ên Îranê dike ku, ji aliyê balafireke bê pîlot ya Amerîkayê ve hatiye encamdan; pirseke ku Amerîkayê bixwe ev red kiriye, û herwisa ragihandiye ku balafira bêpîlot li derveyî sînorên Îranê bûye armanc.


Nûçegihaniyên rejîmê eşkere kirine ku: Pasdar "Husên Selamî, Fermanderê Giştî yê Spaha Pasdarana terorîst, spêdeya roja Pêncşemî 30`ê Cozerdana 1398`an, li civîna ku bo 5400 kesên ku malbatên wan hatine kuştin û ewên ku bûne qurbaniyê siyasetên şaş ên rejîmê li parêzgeha Sine, hatibû lidarxistibû, got: "Îro sibêzû, balafireke bêpîlot ya Amerîkayê dema ku dixwast sînorê Îranê derbaz bike, û êrîşî li ser berjewendiyên me bike, ji aliyê hêzên "Hewa Feza"ya Spaha Pasdaran ve, bû armanc û kete xwarê.

Ev bûyera ku ji aliyekî bûye sedema dilxweşiya xelkê bêzar ji rejîma Îranê, û ji aliyekî din ve jî, tirs xistiye nav dilê nûnerên faşîst ên Tehranê, û bersivdana bilez û micid ya Amerîkayê li pey xwe hebûye, û êvariya hemen rojê jî civînek bilez li Koçka Spî bo beşek ji nûnerên payebilind yên Kongireya Amerîkayê bo heyama demjimêrek û nîv hate lidarxistin.

Herwisa "Nansi Pelosi", serokê mecilsa nûneran di daxuyaniyekê de gotiye ku: Ev rewşa metirsîdar e, û alozî di asta herî bilind de ne, her bi vê sedemê ye jî hewce ye ku, bihêz, hûrtir, û stratîjîk pêngavan hilgirin, dibe hemû aliyek bizane ku em digel rejîmeke dijmnkar û metrisîdar rûbirû ne ku, hewl dide aloziyan biafirîne û van aloziyan jî kûrtir bike.

"Trump" jî, derheq dijberiya welatê xwe got: Heya heyameke din zelal dibe, û ez naxwazim derheq vê pirsê biaxvim, tenê dibêjim ku Îranê şaşitiyeke mezin kir.

Li gorî gotina Fermandehiya "Centcam"ê balafira bêpîlot ya Amerîkayê, bi mûşeka ji "erd"ê ve bo "hewa" ya Spaha Pasdaran û di 34 Kîlometriya peravên Îranê bûye armanc, û li gorî yasayên navdewletî 12 "mayl"iya behrê, wate



22 Kîlometriya behrê, wekî sînorê welatan tê hesab kirin.

Ji aliyekî din ve jî, nûnerê hertimî yê rejîmê di NY de roja Pêncşemî di nameyekê de, ku ji serokê Şêvra Ewlehiyê ya vê saziyê re şandiye, tê de bas ji vê kiriye ku: Tehran alîgirê şer nine û tenê berevaniyê li xwe dike, hevdem Cihgirê Siyasî yê Wezareta Karê Derve yê rejîmê jî, di pêwendiyekê de, digel balyozê Swîsê yê li Tehranê ku wekî parêzerê berjewendiyên Amerîkayê ye, nerazîbûna xwe nîşan daye, ku Amerîkayê sînorên Îranê derbaz kiriye.

Koma van nîqaşane di demekê de ne ku, rojnameya "New York Timse" jî di hejmara xwe ya roja Pêncşemî de, li gorî gotina berpirsekî Amerîkayê belav kiriye ku: "Trump" di dijkiryara xwe de xistina xwarê ya balafira bêpîlot ya Amerîkayê, biryara êrîşa sînordar li dijî Komara Îslamî da, lê, her di qonaxa destpêkê de, ev biryar ragirt.

Her di vê derheqê de jî, roja Înê 31`ê Cozerdana 1398`an, nûçegihaniya "Rouyterse" di raporeke taybet a xwe de eşkere kiriye ku "Donald Trump" hişdariyeke micid ji berprisên payebilind ên Îranê re daye, û di wir de jî bas ji "Êrîşeke nêzîk û nişkêve" hatiye kirin, herçend ku nûçegihaniyên rejîma Tehranê haşa ji hebûna nameyeke wiha dikin, lê "Fox News"ê piştrast kiriye û ragihandiye ku: Di vê peyamê de, hatiye: Amerîka alîgirê şer nine û daxwaza gotûbêjê dike, her bi vê sebebê jî Îran dibe bilez bersiv bide.

Hevdem digel van bûyeran jî, kompaniyayên balafirên "Kantas" ya "Eustraliya" û Kompaniya balafiran ya Holendê "KLM", û dezgeha "hewa pîv" a Ferderala Amerîka û "British Airways" a Birîtaniyayê jî hemû firînên balafirên xwe li ser avên Kendav û geviya Hurmuzê qedexe kiriye.

"Fox News"ê herwisa nivîsiye ku: Wisa xûya ye ku, "Trump", ji biryara pesendkirî ya sala 2001`an ya li dijî "El –Qa`îde" û pêwendiyên vê saziya terorîstî ên digel Komara Îslamî, mifah wergirtiye, da ku navendên navikî ên Netenzê bike armanc.

Bi giştî em dikarin bêjin ku êdî Komara Îslamiya Îranê be`eciye, û zirav jê qetiya ye, bi awayekî ku xeva xweş jê herimî ye, her bi vê sedemê ye jî wekî ku, "Fox News"ê daye eşkerekirin, hemû hêzên xwe di amadebaşiyê de ragirtine.

## Sergotar

# Vê carê dijwar e

N: Kerîm Perwîzî

Berpirsên serbazî û pasdarên rejîmê gefê dixwen ku gerûya Hurmuz bigirin û rewşa navçeyê aloz bikin. Xamineyî, Rûhanî û hevbîrên wan jî ku xwe weke siyasetvan binav dikin, behsa berxwedanê dikin û dibêjin ku ewê Amerîkayê neçar bikin bejna xwe li hemberî wan bitewîne.

Herwisa gefê dixwen ku ewê li ser berjewendiyên welatên navçeyê bibin gef. Hinek ji wan li navçe û cîhanê piropagendeyê dikin ku pêşeroj bi şer aloz dibe û bi vî awayî dixwazin sîyasetvanên Amerîka û Rojava bitirsînin û ji wan re bêjin ku givaşên zêdetir li ser Îranê, wê wêranî, tevlîhevî, tiryak û lehiya penaberan ji bo Ewropayê li pey xwe ve bîne. Ev, siyaseta giştî a Komara Îslamî li hemberî gerra nû a givaşên DYA li dijî rejîmê ye. Stratejiya rejîmê eve ku nîşan bide xerca kiryarên DYA û herwisa xerca êrîşa serbazî bo ser Îranê gellek zêde ye.

Komara Îslamî dixwaze bi tevahiya taktîkên xwe ên dîplomatîk, gefa êrîşê di riya pasdarên xwe re bi pevçûnên sînordar û gefên siyasî û aborî, nîşan bide ku her kiryareke siyasî, aborî û çekdarî ji aliyê DYA ve, wê hezîneyên zaf ji bo navçeyê û bo cîhanê lipey xwe ve bîne.

Weke ku berpirsên Amerîkayê jî dibêjin, rejîma Îranê dixwaze bi standina bacê, mana xwe garantî bike û di siyasetên xwe de berdewam be. Siyaseta sereke a ku Komara Îslamî li ser wê bingehê hatiye avakirin, şerxwazî û çêkirina tevlîheviyan e ku di bin navên curbicur de ye weke hinardekirina şoreşê, rizgarkirina Qudsê, berfirehkirina "Eniya Berxwedanê" û pêkanîna Hîlala Şî`e.

Di pêxema vê siyasetê de Xumeynî digot ku şer nêmeteke îlahî ye û Xamineyî jî dibêje ku ewê bi berxwedanê, şerê mana xwe li Sûriye û Lubnanê bikin da ku neçar nebin li Xûzistanê û li nav Îranê li dijî wan şer bikin. Pêwîstiya vê sîstema îdeolojîk ji bo veşartina gendelî, damayîbûn, nezanî, xurafatê, bi tevlîheviyê ye û niha jî vê hewcehiyê ji hemû gavan zêdetir pêwîst dibîne.

Nebûna pêgeha navxweyî ku ji gotinên Xamineyî jî xuya dibe, tirs li cem rejîmê çê kiriye û li gor wan, dujminan kariye derbasî nav refên xelkê bibin. Bi van sedeman û ji bo bicîkirina siyasetên zêdexwazî û tundajoyiyê, rejîm siyasetên derxistina tevlîheviyan li navçeyê bi kar tîne.

Lewma jî tevî ku di çarçoveya rêkeftina etomî a Bercamê de bi DYA, Ewropa, Rûsiye û Çînê re lihev kiribûn, lê dîsa jî dev ji şandina mûşekan, şandina Pasdaran ji bo derdorê, teror û şerxwaziyê bernedaye. Ev kiryar jî heya astekê bûn ku êdî niha ew ji pevçûnên mezin ditirsin. Siyaseta şerxwazî û fesadiyê, heya niha sedema sereke a mana rejîmê ne ku di bin navê dujminên dervey welat de, hem terorîst û girûpên tungir li navçeyê berfireh kiribe û hem jî li navxweyî Îranê, bi hêsanî xelkê ditepisîne. Lê vê carê, rewş ji bo wan gelek dijwar e. Tevî ku pêwîstiya wan bi çêbûna rewşeke aloz û tevlîheviyê jî heye ji bo ku dema tewandina bejnê, hin imtiyazan bistînin, lê ev rewşa xirab weke rewşa xirab a berê nîn e! Vê carê behsa man û nemanê ye û tenê şaştiyek dikare derfeta bombebarana Cemaranê bi bombeavêjên B-52 çê bike!

Lewra jî Xamineyî weke berê gurregurrê nake ji ber ku wê agirê şer, mala wî wêran bike.

## Şandeke "ENKS"ê serdana Partiya Demokrat kir

**Şandeke Encûmena Nîştimanî ya Kurd li Sûriyê, digel Partiya Demokrat civiya û li ser komek mijarên balkêş gengeşe kirin.**




Roja Yekşemî 16`ê Hezîrana 2019`an, şandeke Encûmena Nîştimanî ya Kurd li Sûriyê, serdana PDKÎ kir û ji aliyê heyeteke hizbê ve bi serperestiya Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê Hizbê pêşwazî ji van hate kirin.

Di destpêka vê civînê de, Mihemed Îsma`îl, cêhgirê sekreterê Partiya Demokratîk ya Sûriyê, spas ji pêşwazîkirina germ ya PDKÎ ji şanda xwe kir û navbirî tevî îşarekirina bi rewşa Rojavaya Kurdistanê û dîroka serhildanên Kurd di vê beşê de, bas ji astengiyên li ser rêya rêzbûn û yekgirtîbûna aliyan di vê parça Kurdistanê de kir.

Piştre Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ tevî xêrhatin gotina şanda mêhvan, derheq rewşa Îran û Kurdistana Rojhilat û derheq dawîn guherînkariyên deverê axavt.

Hicrî di axavtina xwe de, îşare bi têkêlî û arîşeyên di navbera Îran û Amerîkayê de kir û ragihand: "Reftarên berê yên rejîma Îranê, ji me re dide zelal kirin ku, komara Îslamî di rewşa givaş û lawaziyê de, stûyê xwe bo danûstandin û teslîmbûna li hemberî xwedî hêz û aliyên derve radikişîne.

Herwisa navbirî îşare bi hewlên Partiya Demokrat kir bo pêkanîna enî yan hevalbendiya berfireh di asta Kurdistana Rojhilat û Îranê de, bû rûbirûbûna li hemberî rejîma komara Îslamî kir.

Di dawiya vê civînê de, her du aliyan li ser hewcebûna alîkarî û guherînkariyên bîr nerîn û ramanên zêdetir di paşerojê de tekez kirin.

Şanda Encûmena Nîştimanî ya Kurd li Sûriyê, di vê civînê de pêkhatibû:

Sulêman Ebdulmecîd Uso, sekreterê Yekîtiya Kurdistanê li Sûriyê,

Mihemed Îsma`îl, cêhgirê sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê
Feyîsel Yûsif sekreterê Tevgera Çaksazî a Kurd li Sûriyê

Nê`imet Davûd sekreterê Partiya Wekhevî li Sûriyê
Fesle Yûsif, sekreterê Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdistanê li Sûriyê

Nevaf Reşîd, serokê nûneratiya Encûmena Nîştimanî a Kurd yê Sûriyê, li Herêma Kurdistanê

Cede`an Yûsif, endamê nûneratiya Encûmena Nîştimanî a Kurd yê Sûriyê, li Herêma Kurdistanê.

## Şandeke Partiyên Rojavaya Kurdistanê serdana Partiya Demokrat kir



**Şandek ku pêkhatibû li nûnerên hejmarek partiyên Kurd li Rojavaya Kurdistanê, serdana PDKÎ kir.**

Roja Şemî 15`ê Hezîrana 2019`an, şandek ku pêk hatibû li hejmareke nûnerên Partiyên Kurd li Rojavaya Kurdistanê, bi serperestiya Şahoz Hesen Hevserkê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD)ê serdana PDKÎ kir, û ji aliyê heyeteke PDKÎ bi serperestiya Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê Partyia Demokrat, pêşwazî ji van hate kirin.
Di vê hevdîtinê de, Partiyên Rojavaya Kurdistan û heyeta Partiya Demokrat, li ser mijarên girêdaiy pirsa Kurd gengeşe lidar xistin.
Di destpêka vê civînê de, Şahoz Hesen, tevî nîşandana keyfxweşiya xwe derheq vê hevdîtinê de, spas û pêzanîna xwe, derheq pêşwaziya germ ya Partiya Demokrat nîşan da.

Piştire navbirî axavtinek derheq serkevtinên Kurd di Başûr û Rojavayê Kurdistanê, di şerê li dijî teror û herwisa piroseya siyasî ya li Bakûrê Kurdistanê pêşkêş kir, û herwisa di berdewamiya axavtina xwe de, îşare bi gefxwarinên welatên dagîrkar ên Kurdistanê bo ser neteweya Kurd bi giştî kir û wisa texmîn kir ku, guherînkariyên li Îranê dikare derfeteke baş bo tevgera Kurd di vê parçeyê de bilîze.
Şahoz Hesen tekez jî kir ku, rewşa niha li deverê, bi giştî û Kurdistan bitaybet, û ev dixwazin ku partî û saziyên li her çar parçên Kurdsitanê bi yekbûn û yekîtiya neteweyên bihêz, li hemberî gefan bisekinin.

Piştre Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, serkevtinên Kurd di Rojava û Başûrê Kurdistanê de, bitaybet li şerê li dijî terorê, bilind nirxand, û navbirî tekez jî kir ku, heweceye xalên lawaz û kêmasiyên Kurd nas bikin, û herwisa ragihand ku: Nabe rê bidin da ku neyarên me, bi mifah vergirtin ji aloziyên di navbera aliyên Kurd de, dualîtî û jihev veqetiyanê bixin nav rêzên me.
Di berdewamiya vê civînê de, nûnerên her yek ji aliyên din yên Kurd, nerînên xwe derheq vê mijarê de bas kirin.
Di dawiyê de jî, her du aliyan, derheq berdewambûna alîkarî û yek helwêstbûnê tekezkirin û herwisa derheq hewcehiya berdewambûna civînan bi armanca ji yekitir têgiheştina zêdetir, di navbera aliyên Rojavaya Kurdistan û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê tekezkirin.
Şandên aliyên Rojavaya Kurdistanê ku di vê civînê de amadebûn wiha ne:

Şahoz Hesen Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD)

Cemal Şêxbaqî, serokê Partyia Demokrat a Kurd li Sûriyê

Mihemed Mûsa sekreterê Partiya Çep a Sûriyê

Mistefa Meşayêx Cêhgirê Serokê Partiya Yekîtiya Demokrat

Fetullah Husêynî nûnerê Partiya Çep a Sûriyê li Başûrê Kurdistanê

Heval Hûşeng nûnerê Mecilsa Rojava

Sulêman Ereb nûnerê "PYD"ê, li Başûrê Kurdistanê

Cîhan Xelîl nûnera kongireya Star li Başûrê Kurdistanê.

## Mistefa Hicrî di rêûresma sondxwarina yasayî ya serokê Herêma Kurdistanê beşdarî kir

**Rêûresma sondxwarina yasayî ya serokê nû yê Herêma Kurdistanê, di civîneke taybet a parlemana Kurdistanê de hate lidarxistin.**

Roja Duşemî 20`ê Cozerdana 2719`an, (10`ê Hezîrana 2019`an), di civîneke parlemana Kurdistanê di rêûresmeke taybet de û bi amadebûna sedan mêhvanên Kurdistan, Îraq û cîhanê, Nêçîrvan Barzanî, serokê hilbjatî yê Herêma Kurdistanê, sonda yasayî xwar û wekî serokê Herêma Kurdistanê destbi kar bû.

Di vê rêûresmê de, şandeke PDKÎ, bi serperestiya Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê hizbê beşdarî kir, ku tevî pîrozbahîkirin li serokê nû yê Herêma Kurdistanê, li ser siyaseta piştevanîkirin li Herêma Kurdistanê tekez kir û vê kiyana siyasî weke destkefteke girîng a neteweyî bi nav dikin.

Rêûresma sondxwarina Nêçîrvan Barzanî, di Hola Se`id Ebdula, li paytexta Herêma Kurdistanê hate lidarxistin.

Bo vê rêûresmê, di asta cîhanê de, 1200 mêhvan hatibûne gazîkirin.

Li dîroka Herêma Kurdistan û Îraqê, ev rêûresma herî mezin û di asteke herî bilind de bû ku, bo cara yekem bû rêûresmên bi wî awayî tên



lidarixistin, û armanca vê jî ev bû ku, bibe hewlek bo nîşandana Herêma Kurdistan û dezgehên bilind ên wê ji cîhanê re.

## Pêwendiyên Kurdistanî ên Partiya Demokrat, çendîn civîn û hevdîtin pêk anîn

**Pêwendiyên Kurdistanî ên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, bi serperestiya Mihemedsalih Qadirî, çendîn civîn û hevdîtin pêk anîn.**

Roja Sêşemî, 21`ê Cozerdana 1398`an(11`ê Hezîrana 2019`an), şandeke pêwendiyên Kurdistanî ê PDKÎ, bi serperestiya Mihemedsalih Qadirî, digel her yek ji Federasyonên neteweyî ên Kurd ê Soviyeta berê, bi serperestiya pirofisor "Kinyaz Îbrahîm" û Nebyof Yûrî Şamîlofîç", serokê civaka Alîkarî bo gelê Kurd û sernivîserê rojnameya "Rêya Taze", "Kendal Nezan", serokê navenda Kurdî li Firansayê, "Keya Îzul", serokê Federasyona Kurd li Swedê û komek ji kesatyetiyên siyasî û rewşenbîr, çendîn civîn û hevdîtin lidarxist.

Herwisa di van civînan de, derheq girîngî pêdan bi têkilî û alîkariyên di navbera van û digel PDKÎ û hereketa Kurd di Rojhilata Kurdistanê di vê qonaxa nû de tekezî hate kirin.



Herwisa tekezî li ser hevahengîkirina derheq bername û çalakiyên berfireh bo bilindragirtina bîranîna 30.mîn salroja tirajîdiya terorkirina "Dr. Qasimlû", ji aliyê rejîma terorîst a Îranê ve ku hatiye encam dan, û bo vê yekê ku Kurdên derve jî bikarin li welatê Soviyeta berê û welatên Ewropay bi encamdana çalakiyan di vê derheqê de, rûyê terorîzma navdewletî ya rejîma Îslamî nîşan bidin û şermezar bikin.

## Peyama pîrozbahiya Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ ji Serokwezîrê Herêma Kurdistanê re

**Lêpirsyarê Giştî yê PDKI di peyamekê de pîrozbahiya partiyê gehande Mesrur Barzanî Serokwezîrê nû hilbijartî yê Herêma Kurdistana Iraqê.**

Deqa peyam bi vî awayî ye:
Rêzdar cenabê kek Mesrur Barzanî

Silaveke dostane,
Ez ji aliyê xwe û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, pîrozbahiyên germ pêşkêşî we dikim bi boneya hilbijartina we li Parlemana Herêma Kurdistanê wekî serokwezîrê wê herêmê.

Bê guman di vê qonaxê de ku Herêma Kurdistanê ligel gellek pirsgirêk û kêmasiyên navxweyî û derveyî berbirû ye û çavnihêriya xelkê jî li kabîneya nû ya hikûmetê



bi serokatiya we yê rêzdar di asteke bilind de ye, berpirsyariyeke gellek mezin ketiye stûyê we.

Em hêvî dikin bi hestkirin bi vê berpirsyariyê û di heman demê de mifahwergirtin ji hemû derfetan, hûn li ser astengan zal bibin û Herêma Kurdistanê ber bi ewlehî, aştî û avedaniyê rakişînin.
Ligel rêzên dubare
Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Lêpirsyarê Giştî

22. 03.1398

12. 06. 2019

## Semînarek di salvegera terorkirina Dr. Qasimlo de bi rê ve çû

**Li bajarê Amedê a ser bi Kurdistana Bakûr, derheq 30-emîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo, bi beşdariya hejmareke berçav ji hizb û aliyên siyasî semînarek bi rê ve çû.**

Roja Yekşemî 19`ê Cozerdanê, demjimêr 1-ê piştînîvro li gora bernameyekê ku ji aliyê Weqfa "Îsmaîl Bêşikçî" ve, li bajarê Amedê hatibû organîzekirin, semînarek bo 30-emîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo bi rê ve çû.

Ew semînar bi beşdariya heyeta nûneratiya PDKÎ û bi serperestiya Mihemedsalih Qadirî berpirsê Pêwendiyên Kurdistanî ên PDKÎ û bi beşdariya beşeke berçav ji hêz û aliyên siyasî, rewşenbîr û kesayetiyên welatparêz ên Bakura Kurdistanê û medyayan, bi ragirtin deqeyekê bêdengî bona rêzgirtina ji riha pak ya şehîdan dest pê kir. Ew semînar bi nîşandana fîlmeke dekomentarî ku qonaxên jiyan û xebata Dr. Qasimlo bi xwe ve girtibû, dest bi karên xwe kir.

Axavtinvanên semînarê ew kesane bûn:
Mamosta Îsma`îl Bêşikçî nivîskarê mezin û rewşenbîrê naskirî ê Tirkiyê, û dostê rasteqîne yê doza rewa ya Kurd, Mihemedsalih Qadirî nûnerê PDKÎ û Mes`ûd Tek serokê PSK`ê û Îbrahîm Gûçlû rewşenbîrê mêjîn ê Bakurê Kurdistanê.

Axavtinvanan di biyavên dîroka tevgera Kurd û pîlanên neyarên Kurd bo kuştina rêberên wan û bêmaf hêlana wan, armanca rejîma Komara Îslamî a Îranê ji terora Dr. Qasimlo û rêberên PDKÎ, bandora wan teroran li ser tevgera Rojhilatê Kurdistanê, kurtedîroka PDKÎ, rol û kesyetiya D. Qasimlo li serokatîkirina Hizba Demokrat û pêşengatiya tevgera Rojhilatê Kurdistanê di asta navxweyî û cîhanî de, bo beşdaran axivîn, ku koma basan bala beşdaran bo aliyê xwe rakêşa.

Dawî beşa semînarê pêk hatibû ji pirsên beşdaran û bersiva panêlîstan û herweha şermezrkirina rejîma terorîst



a Îranê, û bilindragirtina nav û yad û bîra Dr. Qasimlo û eşkerekirna pitevaniya beşdaran ji PDKÎ û tevgera Kurdistan Rojhilat.

Li dervey karê semînarê jî, Mihemedsalih Qadirî çendîn axavtin derheq vê semînarê û rewşa tevgera Kurdistana Rojhilata bo kanalên ragehandinê kirin.

## Hin keç û xortên şoreşger çeka berevanîkirin ji nîştimana xwe avêtin milên xwe



**Li ser çiyayên Kurdistanê, rêûresma bi dawîbûna dewra destpêkî ya pêşmerge hate lidarxistin, û hejmarek li dersxwenên Demokrat tevlî refên pêşmergeyên Kurdistanê bûn.**

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê, li ser çiyayên Kurdistanê ragihand: Roja Duşemî rêkefta 20`ê Cozerdana 1398`an (10`ê Hezîrana 2019`an), di rêûresmekê de dewra 236`an ya destpêkî ya "Hêza Pêşmergê Kurdistanê", bi amadebûna hejmarek li endamên rêberatiya hizbê, fermanderên leşkerî, kadrên siyasî û leşkerî, pêşmerge û mêhvanan hate lidarxistin.

Di destpêka rêûresmê de, bi sana leşkerî pêşwazî li endamê navenda siyasî ê PDKÎ, "Rehîm Mengorî hate kirin.

Rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û ragirtina bîstek bêdengî ji bo rêzgirtin ji riha pak ya şehîdên Kurdistanê, destpê kir.

Di beşeke din a vê rêûresmê de, ji amadebûyên vê dewra destpêkî ya "Hêza Pêşmergê Kurdistanê" karta pêşmergayetiyê hate dan.

Hevdem di beşeke din de, amadebûyên dewrê sond bi nîştiman xwarin ku, emegnasê rê û rêbaz û armancên şehîdên Kurdistanê dimînin.

Piştire Rehîm Mengorî, endamê navenda siyasî yê PDKÎ, bi hilkefta bi dawîbûna dewra destpêkî ya 236`an ya "Pêşmergê Kurdistanê" axavit.

Herwisa piştî axavtinên Mengorî, sirûda "Qasimlû", ji aliyê amadebûyên dewrê hate pêşkêşkirin.

Ji aliyekî din ve jî, di naveroka rêûresmê de, rapora perwerdehiya Fêrgê, ji aliyê Hêmin, Resûlabadî mamostayê Fêrgê ve hate xwendin.

Piştire peyama amadebûyên dewrê, ji aliyê Şoreş Abdanan ku yek ji beşdarên dewrê bû hate pêşkêşkirin.

Herwisa stranek ji aliyê Omîd Qadirî yek din ji kesên beşdar di dewrê de hate pêşkêşkirin.

Di beşeke din a vê rêûresmê de, kesên yekem heya sêyem yên beşdarê dewrê, di warê cerbandinên siyasî leşkerî û dîsîplîn de, ji aliyê Behmend Dêhiqan fermanderê Hêza 115`an, hatine xelat kirin.

Herwisa di dawiya rêûresmê de, stranek ji aliyê Mîlad Qadirî û heyranek ji aliyê Awat Bayezîdî hate pêşkêşkirin.

# Di jiyana miletana de serok û rêvebir



N: Bûbê Eser

Em hemî dizanin û têdigihîjin ku di jiyana miletan de rol û erkên serok û rêvebiran gellek e. Hin ji bona başiyê, ku welatê xwe bigehînin azadiyê, û dikevin ser rêya ji bona azadiya miletê xwe. Hin ji wan rêvebir û serokan jî hene, tu dibêjî qey tenê karê wan ji bona têkbirina berjwendiya welatê wan e. Ji bona vê jî her li gel dagirkerên gelê xwe ne. Ji wan re xizmetê dikin û ji bona xurtkirina dagirkerên xwe di nava kar û xizmetê de ne.

Lê bi gelemperî jî serok û rêvebirên her miletekî ji bona azadiya welatê xwe têdikoşin, sekna wan tune ye, û bi şev û rojan tenê ji bona azadiya gelê xwe kar dikin. Heger em bala xwe bidin rewşa Rohilatê kurdistanê, rêber û serokên ku hetine û çûne, û yên niha jî henin, hemiyan ji bona vî erkî canê xwe dane, xwe kirine cangiriyê welatê xwe û yên li jiyanê jî dixebitin da ku welatê xwe bigihîjînin azadî û serbestiyê. Heger çiqasî nemir Qazî Mihemed dizanîbû ku dema ew, xwe radestî dagirkerên Îranê bike, wê wî bi dar vekin, lê ji bona berjewendiya gelê xwe, ew yeka kir. Yanî bi gotineke din wî xwe kir cangoriyê welatê xwe.

Li gor baweriya min piştî nemir Qazî serokê herî xurt û bibandor, cangoriyê kurdistanê nemir Dr. Qasimlo bû. Bi serokatiya wî tevgera Rojhilata kurdistanê ji nû ve geş bû, xurt bû, ketibû ser rêya azadiyê. Hemî kurdan çaverê dikirin, ku sibê wê li Rojhilata Kurdistanê, otonemî, federalî ya jî serxwebûn dê bê ragihandin.

Helbet ev rewş ji Dr. Qasimlo ve diyar bûbû. Lê tiştên nediyar ew in ku çawa wî bawer bi dijminê xwe anî û xwest bi awayeke nihênî li gel wan rûnê, da ku li ser mesela Kurdistanê gotûbêj bike.
Helbet di tekoşîna her miletekî de, carna şaşiyên weha dibin. Lê divê nemir Qasimlo ev yeka baş bizanîba. Di eslê xwe de zanîbû, lê ji bona maf bidestxistina kurdan gellek bilez bû, lezeke bêy vê ku baş hesab bike, û fikirek ku ne dema wê bû, kir.

Derd û êşa nemir tenha ew bû ku rojekê berî rojekê welatê xwe azad û gelê xwe bigihîjîne azadiya wî. Ji ber vê yekê bû ku ew şaşî hate kirin.
Lê em vê jî dizanin ku wî hevalbendên xwe, û kadirên partiya xwe jî perwerde kiribûn ku hemî li gel hev, ji bona azadiya miletê xwe, ji bona rehetiya mirovên xwe karê xwe, û ji bona berjewendiya gelê xwe karên xwe berdewam bikin.

Niha jî tekoşîna PDKÎ li ser vê xeta nemir didome. Ev şer û tekoşîn berhemeke ji berhemên nemir Dr. Qasimlo ye.



Heger wî lez nekiriba û bi awayek nihênî li gel dijminê miletê xwe rûneniştiba, niha Rojhilatê kurdistanê hatibû azadkirin.

Lê çi dibe bila bibe, divê em bê hêvî nebin, ew alaya ku nemir Dr. Qasimlo heta canê xwe jî di pêxema wê de gorî kir, wê partiya wî, hevalên wî, dê wê alayê bilind bigirin, heta ku Rojhilata kurdistanê jî bigihîje azadiya xwe.

Camiran ango rêvebir û pêşmêrgeyên qehraman heta niha nesekinîne û nasekinin, li ser rêya Qazî Muhamed û Dr. Qasimlo tekoşîna ji bona azadiya welatê xwe didomînin.
Em baş dizanin ku tolhilanîna herdu nemiran û yên din bi azadiya Rojhilata Kurdistanê dê bê hilanîn.

Wê tu caran gelê Kurda wan rêber û serokên xwe yên di ber doza gelê xwe de bûne cangorî, ji bîr nekin.
Hemî nemir û hêjayên li jiyanê ne, wan, alaya Kurdistaneke azad û serbixwe, yekî gîhandiye yekî din, û niha jî ew ala di destê PDKÎ de ye. Ewên vê alayê heta azadiyê hilgirin û piştî wê jî wê ev ala li ser hemî çiyayên Kurdistanê, di nava hemî dezgehan de bê darvekirin bilind bikin.

Ez 30 saliya cangoriya Dr. Qasimlo bi bîr tînim, wê bûyera nemirovene pirotesto dikim. Dijmin her karê xwe dikin. Ya girîng gelo em çiqasî kar dikin, ew girîng e.

## Derheq birêvebirina merasima 30-emîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî, ku ji aliyê Weqfa Îsma`îl Beşîkçî ve hate birêvebirin, Dezgeha Pêwendiyên Giştî ên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê nameyek ji Weqfa Îsma`îl Beşîkçî re şand, ku eva jêr deqa wê ye:

Birêz Weqfa Îsma`îl Beşîkçî

Silav û rêz

Em hatin agahdarkirin ku weqfa we birêzan, bi helkefta 30-emîn salvegera terorkirina rêberê navdar ê gelê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, bi pêkanîna semînarekê li bajarê Amedê, rêzê ji xebat û têkoşîna vî rêberê giranbuha digirin û nav û bîranîna wî kesayetiyê navdar û dîrokî ê gelê Kurd û rêberê şehîd ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îran (PDKÎ), zindî radigirin.

Bi vê sedemê, ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) ve, ku partiya rêberên birûmete weke Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî ye, em spas û pêzanîna xwe li zehmetî û westiyana weqfa we, û hemû pêkhênerên dilsoz ên vê semînarê dikin, ku bi wî karê mezin, li bajarê Amedê yê Bakurê Kurdistanê, dilê milyonan Kurd û rêvîngên rêbaza Dr. Qasimlo, şad dikin.

Birêzan!
Weke ku hûn dizanin, Dr. Qasimlo ew mirovê zana û kesayetiyê akadîmî û bibandor bû, ku di serdema cîhana ducemserî de, dikaribû bi hişmendî û zanebûna bêmînak a xwe, û birêvebirina siyaseteke waqi`ibînane û serbixwe, bibe navnîşan û nasnameya herî navdar a xebata rizgarîxwaz a neteweya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, û dîrokeke tejî ji serweriyê bo gelê Kurd tomar bike.

Dr. Qasimlo, di dirêjiya temenê xwe de, hemû hewl û xebata xwe, ji bo bicihkirina kultura demokrasî û pêkvejiyana aştiyane, di navbera neteweyên pêkhênerên Îranê de terxan kir, û tevî ku ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve, fetwaya kuştina wî hatibû dayîn, lê ew tim li ser wê rewşê pêdagir bû ku pirsa Kurd pirseke siyasî ye, û divê bi rêya diyalogê û bi awayekî aştiyane ligel desthilata navendî li Îranê, bê çareserkirin.

Piştî serhildana xelkê Îranê û rûxandina rejîma Şah li sala 1979-an, îmamên Îranê, bi rêberiya Xumeynî, dest danîne ser şoreşê û Komara Îslamî damezrand, serbarê wê ku çi baweriya wan bi kêmtirîn maf ji bo gelê Kurd nebû, fetwaya cîhadê jî li dijî jin û zarokên Kurdan derkir, û bi encamdana jenosîd û tawanên dijîmirovî û ji bo nehiştina nasnameya gelê Kurd, mafê herî destpêkî jî, ji bo gelê Kurd, rewa nedît.

Li beramber siyaseteke wiha ya qirkirin û nehiştinê ya Komara Îslamî, li dijî xelkê Kurdistanê, Partiya Demokrat û gelê Kurd, bi rêberiya Dr. Qasimlo neçar bûn, ji bo man û bidestanîna mafên demokrasî û serweriyê, dest bi xebata "berevaniya rewa" bikin û heta niha, di vê rêyê de, bi hezaran kes bûne qurbaniyê terorîzma dewletî ya Komara Îslamî.

Bi taybetî, tawana terorkirina Dr. Qasimlo, di 13.07.1989-an de, li welatê Nemsayê, ku ji bo çareseriya pirsa kurd, li ser maseya danûstandinê bû, ji aliyê dîplomatên terorîst ên rejîma Îranê ve, hate encamdan, mixabin kujerên Dr. Qasimlo ji aliyê dewleta Nemsayê ve, bê girtin û lêkolîn bo Îranê hatin şandin û ji wê jî karesatbartir, ew bû ku dewleta Nemsayê rê neda doza yasayî, ya vê terorê jî, were lidarxistin.

Bi vî awayî, ew karê welatê Nemsayê, ew rastî selimand, ku buhayên mirovî û wîjdana mirovayetiyê li bin bandora bazirganiya di navbera Nemsa û Îranê de, ti qîmet nîne. Dewleta Nemsayê jî, bi wê alîkariya xwe, bi terorîzma dewletî ya Komara Îslamî -ku di rastî de Nemsa wek cergê Ewropaya dergûşa şaristaniyet û buhayên mirovî tê naskirin- muhreke şermazariyê ya hetahetayê ser eniya xwe da, ku ew yek di dîroka wê de, wê bo hetaheta bimîne, û cîhana mirovayetiyê û gelê Kurd qet wê tawanê ji bîr nakin.

Birêzan!
Di demekê de, ku hûn bîranîna 30-emîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî zindî radigirin, ku bikerê wê tawanê, ango Komara Îslamî ya Îranê, niha li hundirê welat û li navçe û cîhanê jî, bi sedema kirîza siyasî, civakî, kulturî, abûrî û...hwd, di dijwartirîn qonaxa temenê xwe de ye. Ev rejîma, hem li nav xelkê Îranê rewabûna wê nemaye, û hem jî bi sedema siyaseta hinardekirina Şoreşa Îslamî û destêwerdana di nav karûbarên welatan de, û piştgiriya wê ji girûpên terorîstî, û bi pêkanîna nearamî û metirsiyê li ser berjewendiyên welatên navçe û cîhanê û hewla çêkirina çekên etomî û mûşekên dûrhavêj, hevsengî û aramiya navçeyê û cîhanê têk daye û ketiye jêr givaşeke mezin a navxweyî û derveyî, herwiha çarenivîsa wê ber bi rûxaneke yekcarî ve diçe.

Di qonaxeke wiha de, partiya me jî, bi piştgirêdan bi îradeya xurt a xelkê mafxwaz ên Kurdistanê, mil bi milê hêz û aliyên demokrat û nîştimanperwer, bi micidî ji bo serwerî, azadî û wekheviya neteweyên bindest li Îranê, têkoşînê dikin, û ji bo gihiştina bi azadî û serkeftinê bi ser dîktatoriya Komara Îslamî û rûxandina wê rejîmê, em niha ji her demekê bêhtir bi serkevtinê hêvîdar in.

Di dawiyê de, em careke din hêvî dikin ku hûn, spas, pêzanîn û destxweşiya me qebûl bikin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Dezgeha Pêwendiyên Giştî
09.06.2019

## Nerîna Lîderan



**Mesûd Barzanî:**

**“Kurdistanê tu caran rêya tolhildanê nedaye pêşyia xwe”.**



**“Donald Trump”:**

**“Êrîşên ser gemiyên neftê karê Îranê bû û geviya Hurmozê tu demî nayê daxistin”.**



**Angela Merkel:**

**“Binpêkirina lihevkirina Bercamê ji aliyê Îranê ve bê bersiv namîne”.**



**Mihemedcewad Zerîf:**

**“Îmarat li pey vê yekê ye ku bibe Îsra`îla duyem”.**

# Îran zêdetirî berê goşegir dibe!



**N: Ce`ifer Eskenderî**

Piştî têkçûna rejîma Pehlewî û hatina rejîma Komara Îslamî, pêwendiyên navbera Îran û Dewletên Yekbûyî ên Amerîkayê û Îran û Erebistana Seûdî xirab bûn.

Sala 1979’an piştî ku Xumeynî rejîma Komara Îslamî ava kir, saziyek bi navê Xwendekarên Rêbaza Xumeynî êrîşî ser sefareta DYA li Tehranê kir. Sala 1981’an Îran û DYA li ser berdana 66 dîplomatên ku Îranê girtibûn, lihev kirin. Lê wan du aliyan ji wê demê ve hemû pêwendiyên xwe ên dîplomasî, qut kirine yan jî hinek karûbarên çûnûhatina welatiyan, di riya sefaretxaneyên din re têne encamdan.

Sala 2015’an DYA li banka Fransî a Parîbas dest danî ser pereyên Îranê û ew pere ku nêzîkî çar milyon Dolaran bûn, dane wan dîplomatan ku Îranê 444 rojan ew girtibûn. Îranê hewl da wan pereyan vegerîne, lê nekarî. Îran hertim, DYA û Erebistana Seûdî weke du hêzên mezin binav dike ku bi alîkariya Îsraîlê, dijatiya Komara Îslamî dikin. Ev çend sal in ku pêwendiyên di navbera Îran û Erebistanê de jî bi giştî qut bûne.

Aloziya di navbera wan de piştî mirina hejmareke zêde ji heciyên Îranî li Erebistanê derket. Pişt re hêzên nêzîkî Sipaha Pasdaran ku xwe weke xweser binav dikirin, êrîşî ser balyozxaneya Erebistanê li Tehranê kirin. Dijberên Komara Îslamî dibêjin sîstema wî welatî nikare mafên neteweyên cuda bide wan. Ji ber wê jî her aliyek siyasî, bi nerînên xwe nêzîkî yek ji wan dewletan e ku Îran dijatiya wan dike û hertim slogana jinavbirina wan hildide.
Piştî ku careke din Hesen Rûhanî bû serokkomar, ti yek ji Îsraîl, Erebistana Seûdî û DYA pîrozbahî li wî nekirin. Wan ragihand ku ew rêzê ji dengê xelkê re digirin lê divê Îran zulmê bi dawî bîne û piştevaniya terorê jî neke. Neyarên Komara Îslamî jî dibêjin ku Rûhanî qet nikare mafê neteweyên nefars li wî welatî bide. Ew dibêjin sedem ev e ku di yasaya bingehîn de tiştek wisa tine ye. Gotinên bi vî rengî li navxwe jî derketin.
Celal Celalîzade parlamenterê berê ê Sine got ku Hesen Rûhanî sozên ku dane Kurdan bicî nekirine û tevî ku 73 ji sedî ji Kurdên Rojhilatê Kurdistanê dengên xwe dane wî, lê ew sozên xwe bicî nayne û divê di hikûmeta xwe de pile û paye bide Kurdan û çareyekê ji vê bêkariyê re bibîne ku li Kurdistanê heye. Lê Komara Îslamî, hertim rexnegiran bi dewletên biyanî ve girê dide.

Heman roja ku Hesen Rûhanî cara duyemîn bû serokkomar û Mihemedcewad Zerîf wezîrê Derve, bang li dewletên Ereb ên derdorê kir ku ji bo pêwendiyên baştir tevbigerin, Îran rastî mezintirîn civîna ji bo goşegirkirina wê sîstemê hat. Serkirdeyên hemû dewletên misilman ji xeynî Îran û Sûriyê, beşdarî civînekê bûn ku Melîk Sulêman şayê Erebistanê û Donald Tramp serokkomarê Amerîkayê li Riyazê ew civîn birêve dibirin. Têde metirsiya Îranê, ji ya Dewleta Îslamî DAÎŞ’ê mezintir hate binavkirin û hate ragihandin ku Îran, piştevana terorê ye.

Tramp û Melîk Sulêman li cem 40 serkirdeyên dewletên Îslamî gotin ku Îran ji 1979’an ve bûye gef li ser navçeyê. Lê dengekî lidij, ji wan 40 serkirdeyan derneket. Tramp heya niha jî di rêbaza xwe a li dijî Komara Îslamî de berdewam e û Sipaha Pasdaran jî weke terorîst binav kir. Lewre divê hemû hevpeymanên DYA jî li vê mijarê mikur bên û êdî diçin kêleka Amerîkayê. Piştî ku pêwendiyên wan zêdetirî berê aloz bûn û Amerîkayê hin hêz jî şandin Kendavê, hewlên serkirdeyên Japon, Berîtanya û Rûsiyê jî nekarîn rewşê aram bike.

Hin terorîstên Îranî, carna dibêjin tevgerên partiyên Kurdî weke Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkşên Kurdistana Îranê bi hemahengî ligel Erebistana Seûdî re ne. Lê ew partî, tim vê îdiayê red dikin. Beriya niha Ebolfezl Hesen Bêgî endamê komîsyona siyaseta derve a parlamentoya Îranê gef li neyarên sîstema Îranê ên li Başûrê Kurdistan xwarin û got emê ji bo jinavbirina wan 40 kîlometran derbasî kûrahiya Îraqê bibin ku mebesta wî Herêma Kurdistanê ye.
Heman kar jî kirin û bi mûşekbarana ser PDKÎ, zêdetirî berê, rûyê rejîmê ê terorîstî derket. Wî herwisa gef li rêxistinên Belûçan jî xwar û got em rê nadin ji Efxanistan û Pakistanê derbasî nav Belûçistana Îranê bibin û endamên Sipaha Pasdaran bikujin. Ebolfezl Hesen Bêgî tekez kir ku Erebistan û Amerîka li pişta Ceyşul Edla Belûçan, PDKÎ û Komele ne. Ew îdiayên wî berpirsê terorîst ê Îranî piştî vê hatin ku Donald Tramp di civîna xwe de li Rizayê bi amadebûna serkirdeyên ji Îraq, Efxanistan, Pakistan û 37 dewletên din re got ku divê hemû alî li navçeya Rojhilata Navîn, ji bo goşegirkirina Îranê tevbigerin.
Wî tekez jî kir ku Komara Îslamî, terorîstan perwerde dike û ev dehan sal in ku agirê kîn û şer li navçeyê xweş dike û dixwaze Îsraîlê jinav bibe. Wî got ku dewsa destên Îranê li Yemen, Sûriye û Îraqê xuya ne. Çavdêr jî dibêjin ku hatina Tramp, Erebistan û Amerîka zêdetirî serdema Barak Obama li hev nêzîk kirine û Tramp wê hevpeymaniya Erebistanê li dijî Îranê mezintir bike ku ev nêzîkî çar salan e li navçeya Kendavê pêk hatiye.

# Nameya Weqfa “Îsmaîl Bêşîkçî” bo PDKÎ

Ez Qazî Mihemed û hevalên wî, Dr. Qasimlo û û hevalên wî, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî bi xoşewîstiyê bi bîr tînim.

Ez nameya ku ji layê Partîya we ve ji bo Weqfa me hatiye şandin, ji hest û ramanên naveroka nameya we re pirr sipas dikim.

Abdurehman Qasimlo, 13ê Temûza 1989an, di xanîyê şuqeyekê bajarê Viyanayê de ji layê ajanên hikûmet û dewleta Îranê ve hate qetilkirin ku ew ji bo hevdîtinê hatibûn şandin. Dr. Qasemlo, di çend deqîqeyên pêşî yên hevdîtinan de hate qetilkirin.

Kujerên Abdurehman Qesimlo û hevalên wî, di nav demeke pirr kurt de terka wî xanî û şuqeyê kirin. Dema ku terka şuqeyê kirin, rastê tu astengî û şopgeriyê nehatin. Polîsên Viyanayê, hîç hewldanek nedan ji bo derdestkirina van qatilan. Kujer di nav demeke kurt de ji Viyanayê û Awustiryayê derketin, gihîştin Îranê. Dema ku evan kujeran ji Viyanayê derketin û ji Awusturyayê derketin, rastê (tûşê) tu astengî û şopandinê nehatin.

Çawa ku polîsên Viyanayê ji bo derdestkirina van kujeran neketin nav hewldanekê, herweha dozgerê Viyanayê jî di derbareyê vê qetlîamê de mehkemeyekê cezyê saznekirin. Ji bo ku li ser vê qetlîamê lêpirsîn bête kirin û kujerên wê bêne mehkemekirin, li layê kurdan ve gelek hewldanên (têkoşan) hatin hatin kirin. Digel van hemû hewldan û daxwaz û zixtan, dozgerê Viyanayê, doza cezayê ji mehkemê nekir.

Hêlena Krulich a hevjîna Dr. Qasimlo, ji bo ku di sazkirina mehkemeya cezayê de bibin alîkar, bi Serokomarên Fransa, Almanya, Îtaliya, Swed û yd. re û herweha bi Serokê Amerîka û Serokwezîrê Brîtanyayê re hevdîtin kirin. Bi tevî van hewldanan, li ser vê bûyerê li Viyanayê mehkemeya cezayê nehat sazkirin. Sebebê sereke yê saznekirina mehkemeya cezayê, têkilîyên ticarî û dîplomatîk ên Awustirya û Îranê ne. Viyana naxwaze tu problem di pêwendîyên wan û Îranê de çêbe. Awustiryayê weha fikir dikir ku di derbarê vê qetlîamê de derdestkirin û hepiskirin çêbe, mehkemeya cezayê bête sazkirin, dê bi Îranê re pêwendîyên me yên ticarî û dîplomatîk xerab bibin. Azadî û heqê Kurdan, neheqîya li hemberê Kurd û Kurdistanê, qet ji wê re ne xem e.

Evana hemû, nîşanê vê yekê ne. Salên 1920an, di dema Cemîyeta Milletan de, li Rojhelata Navîn û li Rojhelata Nêzîk statuqoyek hatiye damezirandin. Di vê statuqoyê de cîyê Kurd û Kurdistanê tune ye. Kurd û Kurdistan hatine dabeşkirin, parçekirin û parvekirin. Li ser Kurdan di her yek parçeyê de polîtîkayên wesa têne tetbîqkirin ku dixwazin navê kurd, zimanê kurdî, kultur û dîroka wan ji rûyê erdê bête hilanîn.

Ev polîtîkaya ku li ser Kurd û Kurdistanê tête meşandin, neheqîyeke pirr gewre ye. Vê polîtîkayê encameke wisa derxistîye meydanê; her wekî parçebûna îskeleta (kakûta) mirovekî ye û belavbûna mejîyê wî/wê ye.

Qetilkirina Abdurehman Qasimlo û hevalên wî, di roja 13ê Temûza 1989an de pêk hatibû. Roja 16ê Adara 1988an jî li Helebçeyê jenosîda Kurdan pêk hatibû. Piştî qetilkirina A. Qasimlo, roja 24ê Eylûla 1992yan, li kafeyekê bajarê Berlînê, serokê wê demê yê PDKÎyê Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî jî ji layê ajanên hikûmet û dewleta Îranê ve hatin qetilkirin. Vana hemû didin nîşandan ku hîn jî neheqîya li hemberê Kurd û Kurdistanê berdewam dike.

Çawa pêşîya ev rûdan û pêkhatinên neyînî tête girtin? Di berîya her tiştî de, divê van neheqî û rûdanên dîrokî yên di derbareyê Kurd/Kurdistanê de bêne zanîn û bîranîn. Ewên ku pêvajoyên dabeşbûn û parçebûn û parvebûn û neheqîyan bizanin, ew dê pêdivîya bexişandina hev û du têbigîjin, ne ku tewîzdayina dijminê xwe. Wê demê dê bixebitin ku bi hev re tevbigerin, bibin hêz û qewet.

İsmail Beşikci

# “Pêşmergeyên Bajar” peymanek rû li xwefiroşan belav kirin

“Pêşmergeyên Bajar” li gundê Şiyanê peyamek rû li xwefiroş û kirêgirtiyên rejîmê belav kirin û dawîn hişdarî ji kirêgirtiyan re dan.

Deqa peyamê wiha ye:

Em wekî pêşmergeyên Bajar li gundê Şiyanê, daxwaz ji xwefiroş û kirêgirtiyên endamên Spaha Pasdaran dikin da ku, dev ji xwefiroşî û îxanetkirinê berdin û bizivirin bo himbêza gel û nîştiman û demldest kincên îxanetê li ber xwe derxînin.

Herwisa hekî wekî berê di îxanetkirin û nîştimanfiroşiyê de berdewambin, rastî sizayên tawanên xwe wê bên û bi tu awayî lêborîn nayê kirin.

Komara îdamê, berdewam hewl dide da ku xelkê tevlî refên besîcan bike û van tûj dike da ku dijberiya nîştimana xwe bikin: Xelkînû agehdar bin ku ev kiryar xeynî sivikatîkirin û nîştimanfiroşî nebe tu berhemeke din lipey xwe nîne.

Tirseke zêde ketiye nav dilê Spaha Pasdaran a terorîst de, û her bi vê hilkeftê jî, bo heyama çend rojan hêla telefona gundan qut kirine.

Silav li riha pak ya rêberên şehîd yên wekî: “Pêşewa Qazîmihemed, Dr. Qasimlû û Dr. Şerefkendî”, silav li hemû şehîdên rêya rizgarî û azadiya Kurdistanê, rêya we berdewame.



Nekevtin heya serkevtinê

“Pêşmergeyên Bajar” ji gundê “Şiyan a ser bi Jawaro”

## Bengdarê madeyên hişber nexweş e, tawanbar nîne



N: Kêyhan Mihemednijad



Berê, bengdarên madeyên hişber weke tawanbar dihatin binavkitin. Di çanda me a kevn de, bengdarbûna bi wan madeyan arîşeyeke exlaqî ye û kesên bengdar yasa binpê kirine! û ev diyarde, bêîradebûna van kesan nîşan dide. Van kesan vîneke gellek lawaz hebûne ku nekarîne li hemberî madeyên hişber bisekinin. Helbet bengdarbûn weke tawan û binpêkariya yasayê dihat binavkirin û di encamê de bi awayekî nebaş reftar bi bengdaran re dihat kirin lê niha hinek xelk pê hesiya ye ku ew nexweş in û tawanbar nîn in.

Gellek caran tê dîtin ku hinek vê nexweşiyê weke tawan dibînin û bengdaran bi zincîr û kindiran ji çar bizmaran re dikişînin û wan îşkence dikin.

Dibe ku bengdar bikarin bi awayên cuda dev ji bikaranîna madeyên hişber berdin; yek ji wan riyan "Kempên Bengdaran"e. Di wan kempan de kesên pispor û amojkarên derûnnasî hene. Yan malbat bendgaran dibin kempê û yan jî ew li ser daxwaza xwe diçin, û hawara xwe ji wan kempan re dibin daku bikarin ji vê nexweşiyê rizgar bibin.

"Kempên terkkirina madeyên hişber çi ne"?

Kempa terkkirina madeyên hişber cihek demkî ye bo bengdaran û bi cewaza fermî a (Saziya Bêhzîstî) tê avakirin. Armanca wan vegerandina laşê saxlem ê kesên bengdar e. Di wan kempan de armancên sereke dermanên derûnnasî, xurtkirina hesta baweriyê û vegerandina wan kesên nexwş ji bo nava civakê ye. Di kempên terkandina madeyên hişber de, eger kesên pispor û şareza weke amojkar û şêwirmend hebin û alîkariya wan bikin, ew kes dikarin bi awayekî tendirust vegerin nava civakê.

Rewşa kempên bengdaran

Li Îranê nêzî 1300 kempên bengdaran hene lê mezintirîn derbeya di wan kempên terkkirina madeyên hişber de li bengdaran dikeve. Ew bengdarên ku carekê li wan kempan bûne behsa rewşeke heyrî a jiyanê di nav wan kempan de dikin û dibêjin: Dema ku em birin kempê, heya du rojan em li darekê di nav hevşa kempê de girê dan û pişt re em bi ava sar ter kirin û bi xurtom û zincîran li me dixistin. Piştî çend rojan car din em îşkence dikirin û dawiyê em birin (Qerentînê), li qerentînê jî em dubare îşkence dikirin. Ew kempên ku rejîma Îranê bo devberdan ji madeyên hişber ava kirine, bi nav kemp in, lê di rastî de îşkencexane ne.

Di nav wan kempan de li dewsa ku bi awayekî baş reftarê ligel bengdaran bikin, lê bi rewşekî gellek xirab bi wan re reftarê dikin. Di encama wan îşkenceyan de heya niha çendîn kes di kempan de mirine yan jî di endamên cuda ên laşê xwe de rastî ziyanê hatine. Herwisa gellek îşkenceyên ruhî jî hene ku bi wan îşkenceyan, kesên bengdar rastî gellek nexweşiyên din jî tên.

Şahidhal dibêjin: Hinek berpirsên wan kempên rejîmê di şeqam û kolanên bajaran de li pey bengdarên madeyên hişber digerin û gumanê li her kesekî bikin, dibin kempê û ji malbatên wan re telefonê dikin ji wan re dibêjin, yan perê kempê bidin yan jî emê zilamên we bibin dadgehê. Malbat jî ji tirsa navûdengê xwe perê kempê didin.

Li welatê "Holend"ê li "Amsterdam"ê navendek bo bengdaran hatiye destnîşankirin ku ew bikarin madeyên hişber peyda bikin. Bi vî awayî rê nayê dayîn ew kes, derbeyê li civakê bidin. Herwisa li welatê Almanya jî, ji bo bengdarên ku derziyên madeyên hişber bikar tînin, derzî û dermanên hewce û binkeyan taybet destnîşan dikin. Ew mînak, nîşan didin berpirsên wan welatan di vê baweriyê de ne ku bengdarbûna madeyên hişber, nexweşî ye û weke tawan nayê dîtin.

Pirsyar ev e gelo dibe ku bi lêxistin û îşkenceyê, nexweşiya dil çareser bibe? Gelo ma dibe kesek ku nexweş e, ji ber nexweşiyê bibin dadgehê?!

Di ola Îslamê de, kesek ku dîn e yan jî di hişê xwe de arîşe hene, nabe bê darezandin. Çimkî li gor dîdgeha ola Îsalmê, ew kes berpirsê kiryarên xwe nîn e. Bengdarbûna bi madeyên hişber jî corek ji nexweşiyê ye ku bandorê dike ser hişê wan û kiryar û karên wan rastî gellek cudahiyên din tên. Di rastî de ew bi ti awayekî nikarin xwe ji kiryarên xwe biparêzin û ew bandor, a madeyên hişber li ser hişê wan e. Bi vî awayî nabe bêjin ew kes, tawanbar in belkî divê ji bo derbasbûn ji vê nexweşiyê alîkariya wan bê kirin.

Lê berovajî wan welatên Ewropî, li Îranê, rejîm bixwe madeyên hişber di nav civakê de belav dike, da ku welatiyan tûşî vê diyardeyê bike û êdî ew daxwaza mafên xwe nekin. Herwisa weke tawanbar reftar bi bengdaran re tê kirin û ew di kampan de têne îşkencekirin. Desthilat jî hewl dide berîka xelkê û malbatên bengdaran vala bike. Gellek bêrêzî û bêhurmetiyan bi malbatên wan dikin. Rêberê rejîmê xwe wek rêberê hemû misilmanên cîhanê binav dike, lê ti yasayeke Îslamê bicî nake belkî weke welatekî totalîtar û dîktaor madeyên hişber di nav civakê de têne belavkirin.

# Semînarek derheq ferhengsazîkirina zimanê Kurdî, li Hewlêrê hate lidarxistin



**Semînarek derheq ferhengsazîkirin di zimanê Kurdî de, bi amadebûna komek li zanayên ziman, nivîskar û siyasetvanên her çar parçên Kurdistanê, li bajarê Hewlêrê hate lidarxistin.**

Êvariya roja Înê, 14`ê Hezîrana 2019`an, derheq ferhengsazîkirin di zimanê Kurdî de, ji aliyê Xalid Cemîl Mihemed, nivîskar û lêkolerê warê zimanzaniyê, li Hotêl Kapîtal a bajarê Hewlêrê, hate lidarxistin.

Di vê semînarê de, PDKÎ bi serperestiya Mihemedsalih Qadirî berpirsê pêwendiyên Kurdistanî yên PDKÎ li Hewlêrê amadebûn.

Xalid Cemîl Mihemed, di vê semînarê de, derheq çavaniya fehengsazîkirina zimanê Kurdî û herwisa bas ji vê kir ku, ferhengukên zimanê Kurdî, di warê şirovekirina peyvan, xiştekirin û pênasekirina pirsgirêk hene û li dîtingeheke rexnekirinê ev mijar nîqaşkir.

Cemîl Mihemed, herwisa derheq sedemên dûcarîbûna şaştiyên ziman di zimanê Kurdî de, îşare bi du sedemên serekî kir ku yek ji van: "Kopîkirina ferhengukên berê û nebûna navendeke lêkoler ya rexenkirinê da zanîn.

Li gorî gotina navbirî di zimanê Kurdî de, tenê 200 ferhenguk hene û heya niha tu hewlek derheq ferheng-



sazîkirina zimanê Kurdî nehatiye dan.

Herwisa navbirî di bersiva pirsa yekem de, got: Armanc li axavtina derheq rewşa ferhengsazîkirin pirtûkxweneyên Kurdî de, sedema rewşa ferhengsazîkirina di zimanê Kurdî de lawazî û nûjenekirin tê de nebûye û hewcehî bi lêkolîn û rexnekirinê heye û bi qasî hewcehiya me bi hebûna ferhengukeke baş heye, ev qas jî hewcehî bi dîtingeheke rexnevergirtinê heye".

navbirî di bersiva duyem de got:  Dizivire bo ser erka kesayetya takekesî, ku di asteke bilind de di warê zansit û hûner li çavçêvera karê ferhengsazîkirinê de ku, di vê erka takekesî de, hewcehî bi alîkariya hevdu bidin da ku bibe  karê bikom, çimkû karê bikom mifaha vê zêdetire.

# Rejîm givaşan dixîne ser cotyarên Kurdistanê

**Rejîma Komara Îslamî, givaşan dixîne ser cotyarên Kurdistanê, da ku berhemên çandinî ên xwe radestî kompaniyayên dewletî bikin.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye malpera "Kurdistanmedia"yê, Komara Îslamî a Îranê, li bajarê Kamyaranê givaş xistine ser cotyaran, da ku berhemên çandinî ên xwe ji kompaniyayên girêdayî rejîmê re bifroşin, û îzina vê yekê ji van re nayê dan da ku, li ser zeviyên xwe û bi perê next ji delalan re bifroşin.

Eva di demekê de ye ku, cotyaran, hemû hewcehiyên xwe di bazarên azad de, û 5 hember zêde ji nirxa ku dewletê diyarî kiriye kirîne û dewletê tu alîkariyek di vê derheqê de ji van re nedaye.

Hevwelatiyekê ku nexwastiye navê wî eşkere be, di vê derheqê de daye zanîn ku:  Rejîmê gef ji cotyarên deverên girêdayî bajarê Ka-



myaranê xwariye, ku nabe bi tu awayî berhemên xwe ji delalan re bifroşin, û dibe hemû berhemên xwe radestî dewletê bikin û eva ji di demekê de ye ku: xelkê hewcehiyên xwe 5 hember bihatir li sala derbazbûyî kirîne û ev yek jî nerazîbûna xelkê lipey xwe hebûye.

Herwisa cotyaran ragihandine jî ku, nabe îzin bidin rejîm, berhemên van bi qer û next û bi nirxeke kêm bibe û daxwaz kirine da ku xelkê deverê li hemberî vê yekê de, berxwedaniyê bikin.

# Zimanê Kurdî

2- Ew + î = ewî : - Ewî hespî bifroşe .

- Ew + ê = ewê :
- Ewê mehînê bifroşe .

- Ew + an = ewan :
- ewan hesp û mehînan bifroşe . Li rojava û bakurê Kurdistanê tîpa (e) ji ser cînavên nîşandan (bi egera sivikbûnê) dikeve û bi şêweyê (vî, vê, van, wî, wê, wan) bikar tên . Helbet ev (e) di raweya verêsê de tê avêtin : 1- Ev + î = ...vî : - Vî hespî bibe mêrgê .

- Ev + ê = ...vê :
- Vê mehînê bibe mêrgê .

- Ev + an = ...van :
- Van hesp û mehînan bibe mêrgê .

2- Ew + î = ...wî : - Wî hespî bifroşe .

- Ew + ê = ...wê :
- Wê mehînê bifroşe .

- Ew + an = ...wan :
- Wan hesp û mehînan bifroşe .

Car caran navên destnîşankirî têne avêtin û cînavên nîşandan cihê wan digrin, bêyî ku çi tevhevî bighêje wateyên hevokan . Wek :

- Ev kî ye ?
- Ev mêvanê kê ye ? - Ew birayê Zînê ye . - Ew xizmên me ne . Li şûna ku em bêjin :

- Ev (mirov) kî ye ?
- Ev (kes) mêvanê kê ye ? - Ew (zilam) birayê Zînê ye . - Ew (jin) xizmên me ne .

Gelek caran alava tekezkirina (teqezkirina) nîşandanê (ha)( )ya ku têgeha rewşeke nependî bi xwe ve digre, li pey navên destnîşankirî bikar tê . Wek :

- Evî xwendekarê ha xelat wergirt .
- Ew dara ha zuha bûye . - Ev bizinên ha, yên kê ne ?

Celadet Bedirxan vê (ha)yê dike cînav( )bêyî ku bibêje, ew çi cînav e û bi çi wateyê tê xebitandin. Bi dîtina min ev (ha), yan jî (he, han) alaveke tekezkirinê ye, ne cînav e. Çiku em dizanin, çi cînavê heye şûna navekî digre, lê ev (ha) cihê tu navan nagre. Anku, em nikarin bibêjin : - Ez (ha) dibînim - (ha) çû û (ha) vegeriya Li şûna ku em bibêjin : - Ez mirovekî dibînim . - Mirovek çû û mirovek vegeriya .

Bikaranîna alava (ha)dû têgehan dide wateya hevokê : 1- Nîşandana cînavan tekez dike, wekî ku di vê

gotebêjê de diyar dibe :
- Tu wî mirovî dinasî ?
- Kîjan mirovî ? (mirov gelek in) - Wî mirovê ha (destê xwe ber bi wî ve dirêj

dike)
- Ha..a..a wî ? Erê ez dinasim !

2- Cihekî yan rewşeke nebinavkirî dide ber navên

nîşankirî,bo wan zelaltir bike .
Wek :
- Ev pênûs, ya wê keça ha ye , (...ew keça li hêlekê, bi tenê, rûniştî, kin, dirêj)
Cînavên nîşandan jî, weku hemû nav û cînavên dîtir, di pêvajoya hevokan de dibin kara, berkarên rasteder û berkarên nerasteder .

Kara (kiryar) :

Çilo nav di rêxistina hevokê de dibe hêmanekî bingehîn, kar û bûyerên hevokê pê ve têne girêdan, wilo jî cînavên nîşandan, ew kar û bûyer pê ve têne girêdan . Wek :

- Ev kesê dipeyive kî ye ?
- Ew bizina ha kayinê nake . - Wî mamosteyî rê da ber min . - Wê keçê pirsiyarek kir - Wanên ha komîtek damezirandin

Berkarê rasteder :

Cînavên nîşandan, bi her dû raweyên xwe ve (ya rasteder û verêsê) dibin berkarên rasteder .

Wek :
- Ez vî hevalî nas dikim .
- Te ew mirovê ha dîtibû ? - Rizgar ew mêvan birin malê - Zîn vê birîndarê derman dike . - Kî van gulan diçine ?
**Dom heye...**

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (352)

## Wêneyên dewra 236 ya destpêkî ya Hêza Pêşmergê Kurdistanê









